Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1231 | 18-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Delîla Agirî: Muzîk rih û rewanê min e

**Dilovan Kêfo/Amûda**

**Hunermeda ciwan Delîla Agirî diyar kir ku mirov dikare bi rêya muzîkê hest û ramanên xwe derxîne holê û wiha got: “Ez bi rêya Muzîkê nameya xwe pêşkêşî her kesî dikim, muzîk ji bo min tîmara rihe.”**



Rojavayê Kurdistanê bi hunermendên xwe yên ciwan dewlemende, bi taybet jinên ciwan di salên dawiyê de bi hunera xwe nasnameya jina pêşeng û çalak derxist holê. Yek ji wan jinên ciwan yên Rojavayê Kurdistanê ku bi hunera xwe nameya xwe belavî her derê dike, Delîla Agirî ye.

Hunermenda ciwan Delîla Agirî li bajarê Amûdê ji dayik bûye, temenê wê 17 salî ye û di qonaxa amadeyê de bi zimanê dayikê xwendina xwe berdewam dike.

Derbarê huner û jiyana xwe de hunermenda ciwan Delîla Agirî ji rojnameya Ronahî re axivî.

Hûnermenda kurd Delîla Agirî diyar kir ku ew ji zaroktiya xwe ve ji muzîkê û dengbêjiyê hez dike, herwiha wê di temenekî pir biçûk de dest bi dengbêjiyê kiriye, ji ber ku ew ji malbateke hunerî ye. Li gorî Delîla ew ji bafê xwe fêrî muzîk û dengbêjiyê bûye.

### ‘Hozan Serhed bandor li min kir’

Delîla Agirî wiha domand: “Min li Çand û Hunera Amûdê cihê xwe girtiye, koma me ya xweser bi navê koma Şehîd Delîla ye. Em tevlî hemû şahiyan dibin û em kêfxweşiyekê derbasî dilê civaka xwe dikin, her wiha du sitrananên min hene, sitrana bi navê Evder Rojava ye û ya din jî em Zarokên Rojava ne. Hûnermendê ku herî zêde bandor li min kir hunermendê nemir Hozan Serhede bû, herwiha tevahiya hunermendên ku ji bo welatê xwe xizmet kirin cihê rêzgirtin û serbilindayêne. Di muzîkê de tu rengên min yê taybet tune ye, kêfamin ji hemû rengan re tê, ji ber ku divê hunermend bi hemû rengan zanibe sitranan bêje.”

### ‘Hunermend dilê civakê’

Delîla da zanîn ku wê bi biryardariyeke mezin tevahiya astengî derbas kirin û wiha got: “Di rêya min ya hunerî de herî zêde malbata min piştgiriya min kir, bi taybet bavê min gelekî piştgiriya min kir û min fêrî muzîk û dengbêjiyê kir. Çi qas astengî di rêya min de derdikeve bi hezkirina min ji muzîkê re astengî derbas dibin. Mirov bi hezkirinê her zehmetiyan derbas dike. Bi taybet hunermend, ji ber ku ew dilê civakê ye.”

### ‘Pêwîste ciwan xeyalên xwe pêk bînin’

Hunermenda ciwan Delîla Agirî axaftina wiha qedand: “Şîreta min ji bû her ciwaneke xwedî xewin û jêhatî ku xwein û xeyalên xwe pêk bîne. Herwiha pêwîste her ciwanek xwe pêşbixe û nerînên neyinî paşguh bike. Herwiha ez dixwezim her dem xwe pêşbixim, hêviya min ku em tevahî bi aramî û aştî jiyan bikin.”



# Hevdîtina êş û hêviyan: ‘Semaha ji bo Kobanê’

**Navenda Nûçeyan**

**Kobanê bajarê ku ji erdê dilê çemên Dîcle û Firatê rabûye. Her dilopek ji wan çeman jiyanê dide damarê axê û bi hezaran tov ji vê axê şîn dibin. Kulîlkên ku bi ber bayê û geşbûna kesk li Semahê direqisin û semah dibe bîranîna berxwedan û jiyanê.**



“Semah ji bo Kobanê” navê tabloyeke hunermend û wênesazê kurd Simko Ehmed e. Simko Ehmed bi pênûseke tijî êş û hêviyê serpêhatiyên jiyana xwe vedibêje. Ew di navbera surrealîzma hemdem û formên razber de pirekê ava dike û hunera xwe ji bo parastina mafên mirovan, azadî û wekheviyê bi perspektîfek dilsoz bikar tîne. Berhemên wî ne tenê diyardeya formên hunerî ne, di heman demê de ronîkirina êş, xewn û berxwedana gelê xwe ye jî.

### Kobanê bû sembola berxwedana cîhanî

Lê Kobanê tenê li ser tabloyên tuvalan xuya nake; Kobanê birîneke li ser erdnîgariya dinyayê ye, birîneke ku di sala 2014’an de bi êrîşa koma DAIŞ’ê kûrtir bû. Ev bajarê ku di wê demê de bû sembola berxwedana cîhanî, bû şahidê şerê 40 rojan; Şerekî ku jin û mêrên Kurdistanê di asta navneteweyî de li kêleka hev sekinîn. Hêzên Parastina Jin (YPJ) û Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ligel Hêzên Gerîlayên Kurdistanê ev bajar ji nav lepên tarîtiyê rizgar bikin. Ji wê demê ve Kobanê ne tenê wek bajarek, her wiha wek sembola şoreşa jinên Kurdistanê tê naskirin.

### ‘Semaha Kobanê’ qet naweste

Ev şoreş, ji azadkirina axê wêdetir, şoreşek di hizir de bû. Jinên ku bi salan di nav çerçoveyên teng ên pergala baviksalarî de mabûn, bi hebûna xwe ya li qada şer re qalibên li ser jinan şikandin. Nîşan dan ku dengê berxwedan û mafên jinan dikare dîwarên zilmê hilweşîne. Lê dîsa jî ev destkeftî dibin armanca êrîşên nû. Dewleta Tirk a dagirker bi piştgiriya çeteyên xwe yên di bin navê Artêşa Niştimanî ya Sûriyeyê de, careke din bi hincetên cuda êrîşî Kobanê kir. Ev êrîş bi taybetî bi êrîşên hewayî ne tenê dibe sedema wêrankirina xaniyan, di heman demê de dibe sedema hewldanên qutkirina dengê berxwedana jinan.

Lê dîrokê nîşan daye ku Semaha Kobanê qet naweste; Vê carê jî jin û mêrên Kurd mîna kulîlkên ku bi her bayê dengekî nû dest pê dikin, li ber xwe didin.

Semaha Kobanê, semaha jiyanê ye; Dengek bêdawî ku bi her lêdanê re bihêztir dibe.

## Bi kamîreya ronahî



Qamişlo

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bû bez û benîşt:**
- Belaya xwe ji min venekir; ji min neqeriya; dev ji min berneda; bi min ve zeliqî.

**Bûye mêşik maye bi pozê min ve:**
- Belaya xwe ji min venake.

**Bû teniya bidohn:**
- Belaya xwe ji min venekir; ji min neqeriya; dev ji min berneda; bi min ve zeliqî.

**Bû benîştê Ecem:**
- Bi heman wateyê.

**Bû qitika xwînê ket derê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bû teniya sêlê/bû teniya berûşê:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye barek gû ketiye stûyê me:**
- Pir xirab e; em nikarin xwe jê rizgar bikin; bûye bela.

**Bûye cila şil ketiye stûyê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye cirm ketiye derê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye cirm ketiye stûyê min:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye kevanokê riha min:**
- Ji bo kesên pir rikoyî tê gotin. (Kevan ji bo jenîna pembû bi kar tê; dema pembû bi tayê kevan ve dimîne zûbizû jê venabe)

**Bûye kevçikek xwîn ketiye pêşiya me:**
- Ji me re bûye bela; pirsgirêkan ji me re dertîne.

**Cila şil e, ketiye mil e:**
- Bûye bela; mirov nikare xwe jê rizgar bike.

**Çala bisinc e:**
- Bi heman wateyê.

**Çavê wan teng dike:**
- Bûye belaya serê wan; wan dixe tingiyê; ji wan re bûye pirsgirêk.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Felsefeya Rêber Apo ji bo pirsgirêka Sûriyê rêya çareseriyê ye’



Endama Kordînasiyona Kongra Star, Jiyan Hisên da zanîn ku ramanên Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûriyê û tevahiya pirsgirêkên cîhanê rêya çareseriyê ye û wiha got: “Çendîn êriş û qirkirin li ser me bên meşandin jî, pêwîste em hertim dozdarên azadiya rêberê xwe bin.”**R-2**

## Dewleta Tirk bi xeyalên Osmaniya Nû xaka Rojava dagir dike




Çalakvanê siyasî û hiquqî Cubraîl Mistefa diyar kir ku çawa dewleta Tirk a dagirker di sala 2018’ an de li Efrînê sûcên şer pêk anî û komkujî kir, îro jî dixwaze heman qirkirinê li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevahî bide meşandin.**R-4**

## Şehîd Ebdulrehman li şûna teslîmiyetê li ber xwe da



Şehîd Ebdulrehman Murşid di sala 1966’an de li gundê Miskê li navçeya Cindirêsê ya girêdayî bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Herwiha bi destpêka belavbûna fikirê Tevgera Azadıyê ew tevlî tevgerê bû, di nava civakê de gelek kar û xebat da meşandin.**R-6**

## ‘Gel jî di xizmeta koçberan de ye’



Rêvebera Ofîsa Plan û Serjimariyê ya Kantona Cizîrê Buşra Şêxê diyar kir ku ji ber rewşa ku gelê Efrîn, Til Rifet, Şehba û Helebê li her bajarekî navendek hatiye erkdarkirin da ku navên penaberan qeyd bike.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1231 | 18-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# YEKRÊZÎ MISOGERIYA HEBÛNA GELÊ KURD E

Piştî têkçûna rêjîma Eseed û kontrolkirina HTŞ’ê beşeke mezin ji xaka Sûriyê re, rûpeleke nû di dîroka gelên Sûriyê de hat vekirin. Di heman demê de êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser destkeftî û hebûna gelê kurd jî gihaşt asteke herî metirsîdar. Di rewşeke wiha hestyar û xeternak de ku Sûriyê tê re derbas dibe, hevrêzî û yekbûna kurdan bidestxistina mafê gelê kurd di Sûriya nû de misoger dike û planên qirkirina gelê kurd têk dibe.**R-3**



## Armanca guhertina minhac aktîvkirina xwendekaran e



Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîra Hac Elî diyar kir ku wan di sala 2024’an de di guhertina minhac û pêşxistina asat perwerdeyê xebateke mezin dan meşandin û wiha got: “Armanca me ji van guhertinan pêşxistin û aktîvkirina xwendekaran di hundirê refê de ye.”**R-6**

`Em li ber rûmeta xwe dikevin`
Nehîr pale R-2


Li Sûrî serdemeke nû û Kurd
Farûk Sakik R-5

Tirkiyê heya goristanê dê pey Kurdan biçe...
Zekî Bedran R-5


Di rewşên aloz û awarte de rewşenbîr li ku ne?
Kemal Necim R-7

# ‘Felsefeya Rêber Apo ji bo pirsgirêka Sûriyê rêya çareseriyê ye’

Endama Kordînasiyona Kongra Star, Jiyan Hisên da zanîn ku ramanên Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûriyê û tevahiya pirsgirêkên cîhanê rêya çareseriyê ye û wiha got: “Çendîn êriş û qirkirin li ser me bên meşandin jî, pêwîste em hertim dozdarên azadiya rêberê xwe bin.”

**Navenda Nûçeyan**

Ev 26 sal in ku Rêber Apo ku xwedî ramanên azad, demokrat û aştiyane ye, di zindanên bêheqiyê de ye. Felsefa wî li ser rûyê erdê ji bo çareserkirina kirîzên heyî li cîhanê tê tekezkirin, bi taybet pirsgirêka Sûriyê û yên Rojhilata Navîn. Derbarê heman mijarê endama Kordînasiyona Kongra Star, Jiyan Hisên bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Hûn sîstema îşkence û qirkirinê ya ku li ser Rêberê Abdullah Ocalan tê meşandin, çawa dinirxînin?**

Ji xwe weke tê zanîn heta roja îro sîstema tecrîd û îşkenceyê li ser Rêber Apo berdewam dibe. Ev 26 sal in ku rêbertî di bin tecrîda giran de dijî. Herwiha nêzî 4 salan bû ku ne malbatê û ne parêzerên wî, hevdîtin pê re çênekirbûn. Weke tê zanîn jî bi komployeke navnetewî rêberê me hat dîlgirtin, sîstema tecrîd û îşkenceya ku li ser dihat meşandin li pêşiya çavên hemû hêzên navnetewî bû. Bi dirêjahiya tecrîda giran a li ser Rêbertî, dewleta Tirk a faşist di şexsê wî de cezayên dispilînê ferz dikir. Tevî ku em dizanin Rêber Apo kesayetekî bi rêk û pêkiya xwe tu kes naghêje asta dispilîna li cem. Armanc ji tecrîdê ew e ku gel û Rêber Apo ji hev qut bikin hem jî şerê ku îro rûdidin li cîhanê û herêmê bên domandin. Piştî çar salan di 23’ê Cotmehê de biraziyê wî Umer Ocalan hevdîtin bi Rêber Apo re çêkir û Rêbertî nameyek ji bo gel rê kir. Di wê nameyê de Rêber Apo tekez kir ku tecrîd hîna berdewam e, ev yek jî tê wateya ku pêwîste li hemberî tecrîdê berxwedaniyeke mezin bê meşandin. Li aliyekî din ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd Rêber Apo axivî û got ku derfet li cem min heye ku ez gelek pirsgirêkan li Rojhilata Navîn çareser bikim. Piştî vê hevdîtinê dîsa dewleta Tirk a faşist cezayên displînê derheqê Rêber Apo de ferz kir. Çendîn ku malbat û parêzerên serokatî daxaza hevdîtinan kirin lê dewleta Tirk ev yek qedexe kir. Ev yek jî da ku şer û dagirkeriya Tirk li ser herêmê pirtir û kûrtir bibe. Em dizanin ku li seranserî Kurdistanê şerek tê meşandin û em weke gelê kurd û tevahiya gelên din hewcedarî Rêber Apo ne da ku rêya me ronî bibe.

**-Di dema heyî de Rojhilata Navîn û bi taybet Sûriyê, di tevlîheviyekê re derbas dibe, ji bo ku hemû pirsgirêkên heyî bên çareserkirin, pê re jî pêşerojeke aştiyane li ser hîmê demokrasiyê ava bibe, rêya çareseriyê çi ye?**

Eger em rewşa Sûriyê binirxînin dê bînin ser ziman ku ev zêdeyî 13 salan e Sûriye di tevlîheviyê de bû, şoreşek dest pê kirbû. Xwesteka gelan ji vê şoreşê ew bû ku siyaset, serwerî û sîstema berê ya rêjîma Beisê were guhertin. Lê mixabin bi dirêjahiya 13 salan rêjîmê danûstandin qebûl nedikir û li ser heman hişmendiyê bû. Rêveberiya Xweser gelek caran xwest ku diyalogê bi rêjîmê re bike, lê dîsa rêjîm ev yek qebûl nedikir. Lê piştî 13 salan me berî çend rojan dît ku çawa rêjîma Beisê bi pêşengtiya Essed hat hilweşandin di encamê de jî valahiyek kete Sûriyê bi gişî. Di heman demê de ji 27’ê Mijdarê ve şerekî dijwar li seranserî Sûriyê ji aliyê koma Tehrîr Elşam ve têkirin. Herwiha komên çete yên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê bi awayekî hovane, êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Li aliyekî, Rêveberiya Xweser pêşwaziya koçberan dike, li aliyê din jî gelên me berxwedaniyeke mezin didin meşandin. Îro Rojhilata Navîn û cîhan tev di kirîzan re derbas dibe, mîna şerê Israyîl û Hemasê, hem jî şerê di navbera Rûsya û Ukraniya de. Bi dirêjahiya 13 salan tekz bû ku ne hikumeta Şamê û ne Muxalefetê dikarîn guhertinê û çareseriyê ji bo Sûriyê pêk bînin. Lê tecrubeya Rêveberiya Xweser ya projeya biratiya gelan û Neteweya Demokratîk ya li ser bingeha wekheviya gelan, hat diyarkirin ku rêya tekane ya çareserkirina pirsgirêkên heyî ye. Di warê piratîkî de ev proje li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê îroj hemû pêkhate jiyan dikin. Em dizanin ku her alaneke ku hatiye rizgarkirin, hêz û rêveberiya wê çêbûye û civak bi li wir xwe diparêze. Berî niha Rêber Apo gotiye rêya çareserkirina kirîza Sûriyê ye, em jî dibêjin fikr û felsefeya Neteweya Demokratîk ya Rêbertî, cihê çareserkirina pirsgirêka Sûriyê û cîhanê bi giştî ye. Hetanî ku pirsgirêka Sûriyê çareser bibe pêwîste projeya Neteweya Demokratîk li hemû Sûriyê were meşandin.




**-Pêngava Azadiyê niha di çi astê de bi rê ve diçe?**

Di roja îro de li ser asta cîhanê pêngaveke mezin ji bo azadiya Rêber Apo di qonaxa xwe ya duyem de didome, gelê kurd û yên cîhanê tev ji bo azadiya Rêber Apo têkoşîneke bêhempa dikin. Li tevahiya Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û welatên cîhanê bi azadiya fîzîkî ya Rêbertî bang tê kirin. Em dizanin ku eger ne ji berxwedaniya gelan a li ser asta cîhanê ba, wê hevdîtina ku bi Rêbertî re hat kirin pêk nehatiba. Ev hevdîtina ku çêbû ji bo me gelekî girîng bû, ji ber Rêber Apo nameyeke watedar ji bo me şand. Di wê nameyê de hat xuyakirin ku pêwîste asta têkoşînê ji wiha bilindtir bibe. Di roja îro de gel di tevgerê de ye, li her derê gelên me yên azadîxwaz li qadan in. Berî demekê meşeke mezin ji bo azadiya Rêber Apo li Kolnê çêbû, meşeke bi bandor û dîrokî bû. Di roja îro de gelên me li ser asta cîhanê li ser piyan in û her tim çalakî ji bo azadiya fîzîkî didomînin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em dibînin ku ji ber rewşa tevlîhev heya astekê çalakî rawestiyane. Lê dîsa em bi rêbazên xwe yê cuda weke hemû pêkhateyên herêmê kar û xebatê ji bo azadiya Rêber Apo kar dikin. Nemaze xwendina perspektîfên Rêber Apo ku gelekî sûd jê tê wergirtin. Em îro bangewaziyê ji hemû gelan li her derê û her demê dikin ku bila mijara me ya sereke azadiya fîzîkî ya Rêberê Apo be. Çendîn êriş û qirkirin li ser me tên meşandin jî divê em hertim dozdarên azadiya rêberê xwe bin. Bi taybet em weke jin ji ber ku em deyndarên Rêber Apo ne, divê em rêzeçalakiyên xwe bidomînin û asta têkoşîna jinê bilindtir bikin.



## Ji Pênûsa Jin

### `Em li ber rûmeta xwe dikevin`

Nehîr Pale

Li Sûriyê di navbera 21`an rojan de bûyerên gelekî giran qewimîn. Jina Kurd a koçber bi dilekî êş digot:` Em li ber kerameta xwe dikevin`. Li gorî min şopand li Şehba, Minbic û hemû bajarên Sûriyê rûmeta jinê hat binpêkirin. Çeteyên Tirkiyê li Şehba û Minbicê destpêkirin destê xwe tavêjin rûmeta jinê. Hikûmeta Sûrî ya ku nû hatî ava kirin jî li gorî ku diyar dibe wê ji Talîban ne çêtir bin. Ji niha ve saziyeke bi navê polîsên exlaqî ava kirine û destpêkirine wê hêdî-hêdî jinê ji hemû xebatan dûrbixîn in. Wezîrê Dadê ku hatiye diyar kirin di axaftina xwe ya destpêkê de qedexe kir ku jin bibin parêzer û dozger. Jinên Efrînê ji sala 2018`an heyanî 2024`an li bendê bûn ku vegerin ser xaka xwe Efrîn. Roja 1`ê Kanûnê çeteyên Tirkiyê Şehba dorpêç kirin û ji her kesî re hat gotin ku xwe amade bikin wê ji Şehba derbasî Tebqa û Reqayê bibin. Jinên Efrînê yên ku li Şehba bûn heyanî niha bawer nakin ku çawa ji çeteyên Tirkiyê rizgar bûne û neketine destê wan de. Her tirsiyane ku ew jî mîna jinên Şengalê esîr têkevin destê çeteyan de. Çete destdirêjî wan û keçên wan bikin, an jî wan li bazaran bifroşin.

Jin li kîjan welatî be dema ku şer li gel wan biqewimê tişta destpêke tê bîra wan rûmeta wan e. Ji sedsalî û vir ve jinên Kurd ji bo nekevin destê leşkerên Tirk an jî nekevin destê pêşmergeyên PDK`ê, çeteyên DAIŞ û çeteyên Tirkiyê çalakiya fedayî kirine. Ax, çand, ziman, rêgez hemû ji bo jinê rûmet e. Dayîka şehîd Arîn Mîrkan Wehîde Henan her digot:` Keça min em li ber kerameta xwe ketin`. Ev tê wateya xak rûmeta wê ye û li gel wê rûmet ji av û nan binirxtir e.

Rûmet wê çawa were parastin? Di navbera feraseta namûs, şeref û rûmetê gelekî cûdahî heye, eger em nikarbin vê cûdahiyê bibînin an îfade bikin, dibe ku rûmeta me her tim were binpêkirin. Civaka zayendperest bi feraseta namûs û şerefê ci ji rûmetê re nehiştiye, dawî li hebûna wê aniye û niha namûs û şerefa civakê jin e. Girêdana rûmetê bi ax, exlaq, zanebûn, çand, ked û rêgezan ve heye. Ew xaka ku dayîka Wehîde Henan rûmeta xwe lê hîs dikir, hat dagirkirin, ew û hemû jin neçarî koçberiyê kirin, ji ber vê yekê ew hîs dike ku destdirêjî rûmeta wê kirine. Dayikeke Kurd ku temenê wê 76 salî ye li ber rûmeta xwe ketiye. Eger xak were parastin wê rûmet jî were parastin. Hemû jin mîna dayîka Wehîde tenê li ber rûmeta xwe ketine. Ji ber rûmet her tiştê jinê ye. Jin dema daxwaza mafên xwe dikin, ew dixwazin rûmeta xwe biparêzin. Parastina rûmetê jî bi rêxistinkirinê tê kirin. Çiqasî jin xwe birêxistin bike ew qasî dikare rûmeta xwe biparêz e. Dewleta Tirkiyê û çeteyên wê êrîşî rûmeta jinê dike û her tim rûmeta wê binpê dikin. Kîjan jin ji bo rûmeta xwe têbikoşe sîstemên desthilatdar êrîşî wê dikin û dixwazin dawî li hebûna wê bîn in.



# Serboriya sînemevanên jin ên Îranê

Li Îranê serboriyeke balkêş ya jinên sînemavan heye. Heta demekê tim rolên ne baş û xerab li wan dihatin ferzkirin. Bi têkoşîna jinan a di salên buhirî de, bi wêrekiya ku jin ji serhildana ‘Jin Jiyan Azadî’ wergirtin, jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê di sînemayê de serkeftinên şênber bi dest xistin.

**Navenda Nûçeyan**



Yekem xuyabûna jinan di sînemaya Îranê de vedigere sala 1894 ’an, di filma “Keça Lor” de ku Rohangiz Samîncad dileyize. Piştî şoreşa Îranê ya sala 1957’an, rol û hebûna jinê di sînemayê de ji polîtîkayên zayendperest ên dewletê bandor bû. Mînak di filma “Keça Lor” de behsa hebûna jinan weke karakterên sereke nayê kirin. Filma “Keça Lor” ji aliyê Şahê Îranê Pehlewî ve hatiye çêkirin. Pehlewî bi rêya vî filmê têkoşîn û berxwedana jina jîr Qedem Xêr Loristanî hedef digire û modêla jin û civakê ya li gorî civaka kapîtalîst pêşkêş dikê. Herî zêde jî bi rêya sînemayê erişê jinên Lor dikê.

Ji ber nîşandana filmên ku li gorî pîvanên nû yên Komara Îslamî ne, gelek sînema hatin girtin. Her wiha di film û sînemayan de hebûna jinan di cil û bergên eşkere de hate rexnekirin û gelek qedexe hatin danîn.

### Qedexeya li ser sînemayê

Di vê serdemê de gelek sînema hatin şewitandin û filmên beriya şoreşê wek sembolên fesadî û fuhûşê hatin dîtin. Xumeynî di axaftinên xwe de sînemaya ‘beriya şoreşê’ weke ‘navenda fuhûşê’ bi nav kir. Her wiha destnîşan kir ku divê sînema ji roja yekem ve xizmeta Îslamê bike û ji aliyê dewletê ve bê yekdestdarkirin. Ev siyaseta ku ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve li hember sînemayê hatiye sepandin, bû sedema tasfiyekirineke berfereh ya sînemayê û gelek lîstikvan û derhênerên navdar ên wê serdemê hatin qedexekirin an jî neçar bûn ji welêt derkevin.

Ev guhertin bûn sedem ku sînemaya Îranê berê xwe bide filmên bi temaya şoreşa îslamî û gelek filmên kevn hatin qedexekirin. Li cîhanê jin di sînemayê de ne tenê weke lîstikvan, weke derhêner, nivîskar, çêker û gelek qadên din jî cih digirin. Lê jin di cîhanê de hîn jî di qada sînemayê de bi nêzîkatiyên zayendperest re rû bi rû dimînin.

### Astengiyên sînemavanên jin

Beriya şoreşa 1938’an, jin di sînemayê de bi wêneyên kevneşopî û klîşeyê derdiketin. Tevî gelek astengiyên ku jinên Îranê di nava bîst salên dawî de di warê sînemayê de bi dest xistine, rêjeya derhênerên jin di sînemaya Îranê de ji welatên rojava zêdetir zêde bûye. Her wiha jin di sînemaya Îranê de bi gelek astengiyan re rû bi rû dimînin, di serî de sansur. Van qedexeyan çarçoveya filman, lîstikvan û tewra mijarên wan jî dihewîne. Di sînemayê de karakterên kevneşopî yên wekî dê, jin û keç li ser jinan tên ferzkirin.

### Daxuyaniya sînemavanan

Di sala 1981’an de zêdetirî 800 jinên sînemager ên Îranî daxwaznameyek îmze kirin û daxwaz kirin ku tundî, tacîz û şantajên zayendî li sînema û şanoya Îranê bi dawî bibe. Ev daxuyanî bû sedema bertekên berfireh û hin jinên îmzekar rastî gef û zextan hatin.

Li hember vê daxuyaniyê, Mihemed Husên Ferahbax, yek ji berhemhênerên sînemaya Îranê, daxwaza cezakirina van jinan û qamçiyan kir û ew bi xiyanetê li sînemayê tawanbar kirin. Ev daxuyanî berxwedana hin koman li hember guhertin û reformên sînemaya Îranê nîşan dide.

Her wiha li Îranê, filmçêker û aktorên jin rastî gelek kêşeyên civakî û çandî tên ku dikarin bandorê li kar û jiyana wan bike. Jin ji bo vê di qadên sînemayê de, bi mijarên filmên ku hildibijêrin têdikoşin. Di vê wateyê de giranî li ser jin û berhemên sînemayê yên bi temaya civakê tê girtin. Li ser mijarên wekî mafên jinan, zehmetiyên civakî, rola jinê di civakê de cih digire û hewl dide têkoşîna jinê bigihîne temaşevanan.

Lê jinên Îranî bi hewl û sekna xwe, di warê lîstina rolên aloztir û realîst di warên curbicur ên sînemayê de, ji wan derhênerî, nivîskarî û lîstikvaniyê, serkeftineke berçav bi dest xistine. Jinan di sînemaya Îranê de rolên curbecur û girîng lîstine û bi demê re di vî warî de ji bo xwe cih girtine.

### Bala cîhanê kişandin ser xwe

Jinên Îranî di filmên cuda de, ji rolên kevneşopî heta rolên malbatî û karakterên tevlîhev û nûjen, rolên curbecur lîstine. Lîstikvanên wek Nîkî Kerîmî, Hadîh Tehranî, Taraneh Elîdostî û Leyla Hatemî bi lîstikên xwe yên bi heybet ve bala cîhanê kişandin ser xwe. Di salên dawî de hejmara derhêner û nivîskarên jin di sînemaya Îranê de zêde bûye. Derhênerên wek Roxşan Benî-Etmad, Tehmîne Mîlanî û Nergês Abiyar bi çêkirina filmên bi bandor û serkeftî di guhertina helwest û nûnertiya jinan di sînemayê de roleke girîng lîstin.

### ‘Jin Jiyan Azadî’ wêrekiya wan zêdetir kir

Di van salên dawî de sînemagerên jin ên Îranî di xwepêşandanên li dijî newekhevî û neheqiyê de roleke girîng lîstin. Piştî ku Jîna Emînî ji aliyê dewletê ve hat qetilkirin, jinan dest bi serhildana şoreşgerî ya “Jin Jiyan Azadî” kirin. Gelek jinên di qada sînemayê de piştgiriya xwe ya ji bo vê şoreşê anîn ziman û kefenê xwe rakirin.

Şoreşa çandê ya ku li Îranê bi dirûşma “Jin Jiyan Azadî” li Îranê pêk hat û hê jî didome, bû sedem ku li dijî baviksalarî û kapîtalîzmê li ber xwe bidin. Vê berxwedanê di qada sînemayê de cesaret da jinan.

### Jinên sînemavan ên Îranê

Rola jinê di sînemaya Îranê de ji destpêka xwe ve heta niha rastî gelek guhertinan hatiye. Li jêr ez ê behsa hinek ji van geşedanan û rolên girîng ên jinan di sînemaya Îranê de bikim:

### Serdema berî şoreşa Îslamî (1957)

Roohangiz Saminejad: Yekem lîstikvanê Îranî yê ku di fîlma “Keça Lêr” (1894) de lîstiye. Ev fîlm wek yekem filmê dengbêjî yê Îranê tê naskirin.

Fûrûx Ferroxzad: Helbestvan û fîlmçêkerê bi nav û deng ku bi belgefîlma “Mala Reş” (1923) navdar bû. Ev fîlm yek ji berhemên girîng ên sînemaya belgeyî ya Îranê ye.

### 1979: Destkeftên jinan di warê sînemayê de di dema şoreşa Îslamî û piştî wê de

Roxşan Benî Etemad: Yek ji navdartirîn derhênerên jin ên îranî, ku bi fîlmên wekî “Narges” (1950) û “Xatûna Erdîbeheşt” (1956) navdar bû. Di fîlmên xwe de bi pirsgirêkên civakî û pirsgirêkên jinan re mijûl dibe.

Tehmîne Mîlanî: Derhêner û nivîskara ku bi fîlmên “Du Jin” (1957) û “Nîve Veşartî” (1960) behsa mafên jinan û pirsgirêkên civakî kiriye.

Manîje Hîkmet: Derhêner û berhemhêner ku bi fîlma xwe ya bi navê “Zindana Jinan” (1959) behsa mijarên mafên mirovan û rewşa jinan di girtîgehên Îranê de kiriye.

## Têbînî



### Di rewşên aloz û awarte de rewşenbîr li ku ne?

Kemal Necim

Tê gotin ku sedemên sereke yên şoreşa Fransî ne dijwariya neheqiyê an tengahiya rewşa jiyanê bûn, lê belê ji encama ramanên rewşenbîrên mîna Voltaire, Rousseau û Montesquieu de şoreş lidar ketiye. Ji ber li gorî agahiyên dîrokî Rewşa jiyanî ya gelê Fransî wê çaxê ji ya gelên Rûsya, Almanya û Spanya baştir bû.

Dibe ku ev bîr û boçûn li gorî rewş û mercên îroyîn ne gucaw be, ango em êdî nikarin behsa roleke wiha bi bandor a rewşenbîran bikin ku karibin şoreşên civakî yan netewî lidar bixin. Lê mirov nikare rola rewşenbîran di civakan de paşguh bike, çi ji bo xerabiyê çi jî ji bo başî û avakirinê, bi taybet di rewşên aloz û awarte de.

Dibe carna were bîra hin kesan ku dema em behsa rola rewşenbîran di pêvajoyên aloziyan û rewşên awarte de dikin, em ji wan dixwazin ku rahêjin pênûsên xwe û çîrok û helbestan binivîsin. Dibe ku ev jî yek ji delametên rewşenbîran be, lê tişta pir girîng ku em behsê dikin, helwest û bîr û bawerî ye. Ka çiqas dikarin bibin palpişt û alîkar ku barê aloziyê li ser civaka xwe û netewa xwe kêmtir bikin, çiqasî dikarin bibin egerên aramî, ewlehî û hêviyê.

De demên derbasbûyî de geşedanên pir lezgîn û awarte li tevahî Sûryeyê çêbûn, van geşedanan bi awayekî rasterast bandoreke mezin li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Di encamê hin rûdan û bûyerên bi êş çêbûn, mîna bûyera koçberkirina xelkên Efrîn û Şehbayê ku trajedyayeke mezin pêk hat. Di rewşeke wiha pêwîstî hebû ku xelkên herêmê erk û berpirsyariya xwe ya ji bo pişgirî û mêvandariya koçberan bike. Ji xwe di rewşên wiha de rola rewşenbîran berz dide, ne ku rahêjin pênûsê û binivîsin, lê dakevin tax û kolanan, destpêşxeriyan birêxistin bikin û bibin pêşengê piştgiriya gelê xwe yê koçber. Dibe ku hin rewşenbîran an jî hin saziyên rewşenbîrî ev erka xwe ji bîr nekiribin, lê mirov nikare behsa roleke ber bi çav û çalak bike.

Li kêleka vê rûdana koçberiyê, piştî hilweşîna rejîma Esed, rewşa Sûriyeyê bi giştî aloz bû, pêşeroj hîna nediyar e, rewş hîna zelal nebûye, dewleta Tirk jî çeteyên xwe û alîgirên xwe xistin liv û tevgerê û bi rêya nûçe û agahiyên derew xwestin civakê bitisînin, şaş bikin û bêhêvî bikin. Di rewşeke wiha de eger rewşenbîr tenê rexneyan bike û tenê tiştên reş bibîne û di platforimên xwe yên ragihandinê de reşbîniyê belav dike, wê çaxê ew roleke neyînî pêk tîne û bandorên aloziyê li ser civakê girantir dike.

Rewşenbîrekî pabend û durist, pêwîse karibe aramî û hevsengiyê di nava civakê de pêk bîne di demên aloziyan de û karibe bi şiyan û zanebûna xwe agahî û nûçeyên derew û reşbîniyê çêdikin, nas bike bi xelkê bide nasîn û li şûna wê, egerên xweşbînî, aramî û hevgirtina civakê belav bike.

Dibe ku rewşenbîr nikaribin berê rûdanên mezin û guherînên mezn biguherin, lê dikarin bibin egera kêmkirina bandorên nebaş, kêmkirina êş û azaran û sepandina xweragirî, hişyarî û hêviyê.

# Şehîd Ebdulrehman li şûna teslîmiyetê li ber xwe da

Şehîd Ebdulrehman Murşid di sala 1966'an de li gundê Miskê li navçeya Cindirêsê ya girêdayî bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Herwiha bi destpêka belavbûna fikirê Tevgera Azadıyê ew tevlî tevgerê bû, di nava civakê de gelek kar û xebat da meşandin.

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

Di vê dema dawî de dema ku êriş li ser Heleb û Şehbayê ji aliyê Tehrîr Alşam ve hate kirin. Bi darê zorê miletê wan hereman koçber kirin, herwiha dema ku koçber direviyan ji aliyê çeteyan ve hatin girtin û serjêrkirin. Lê şehîd Ebdulrehman Murşid dema ku ket destê çeteyan xwe teslmî nekir û jiyana xwe bi dawî kir.
Di derbarê jiyana şehîd Ebdulrehman keça wî jîn Murşid ji rojnameya me re axivî.







### Kar û xebata Şehîd Ebdulrehman Murşid

Jîn Murşid anî ziman ku Şehîd Ebdulrehman Murşid di destpêka belavbûna fikirê PKK'ê de û di sala 1988' an de tevlî tevgerê bû û wiha got: "Şehîd Edulrehman di destpêka belavbûna fikirê PKK'ê de bi welatparêzî û kedê dihate naskirin û cihê xwe di nava kar û xebatê de digirt. Herwiha gelek kes bi xwe re komkirin û bi hev re karê nava civakê dida meşandin, di heman demê de ket zindanên hikumeta şamê û gelek îşkence lê hate kirin. Cara destpêkê di sala 1993'an de, di zindanên Helebê û şamê de her cûreyên işkence û lêdanê li ser hate meşandin, lê rixmê wê yekê jî ew her tim di nava kar û xebatê de bû û her tim fikir û felsefa Rêber Apo ji bona xwe esas digrt. Di gelek sazî û navendan de kar û xebat da meşandin û cihê xwe girt. Li asayîşa Cindirêsê karê komîta li hev anînê de cihê xwe girt, herwiha di kar û xebatên peywendiyên leşkerî de jî li herêma cindirêsê bida meşandin."

### Heta nefesa xwe ya dawiyê di nava kar û xebatê de bû

Jîn Murşid da zanîn ku Şehîd Ebdulrehman Murşid gelek kar li Efrînê jî dane meşandin û dema ku Efrîn hate dagirkirin ew jî koçber bû û wiha şîrovekir: " Dema ku di sala 2018'an de bajarê Efrînê hate dagirkirin, koçberî Şehbayê bû. Herwiha li Şehbayê jî kar û xebata siyasî di nava partiya Tehalif de dida meşandin, Partiya Hevgirtina Niştîmanî Demukratîk ya sûrî yekem navend bû, ku wî kar û xebat lê da meşandin û heyanî ku şehîd jî ket di nava partiyê de kar û xebat dida meşandin. Di heman demê de tevlî hemû cureyên işkenceyê kar û xebatên xwe berdewam dikir û li Şehbayê jî her tim di nava berxwedaniyê de bû. Di karê xwe de jî di milê jiyanî û civakî de karê xwe berdewam dikir. Her tim coş dida hemû kesî, cara duyemîn dema ku êrişî li ser Şehbayê çêbûn, koçber ji şehbayê derketin. Piştî ku hat dorpêçkirin xwe radestî çetan nekir û xwe şehîd xist."

### Bandora Şehdetê

Jîn Murşid axftina xwe wiha bi dawî kir: " Bi bihîstina şehadeta bavê min ji bo gelekî pir bi êş bû û bi taybet di vê rewşê de gelekî zehmet bû. Herwiha şehadeta bavê min ji bona me pir bi êş bû, lê dema ku em rewşa gelê me yên Şehbayê yên ku ji rewşa bavê min girantir dibînin dibîn ew rewş ji ya bavê min bi êştir bû. Ji ber ku bavê min xwe radestî dijmin nekir û wî bi xwe ev rê ji bona xwe hilbijart, wî qebûl nekir ku bikeve destê dijmin, ji bo ku neyê işkencekirin. Wî xwe şehîd xist, bi şehadeta bavê xwe em ser bilindin. Ji ber ku digot ez qebûl nakim ku bikevim destê çeteyan, şehadeta bavê min bandoreke mezin li ser me, kes, malbat û hevalên wî kir. Bi taybet dayîk û xwişka min ya biçûk, kesên ku bavê min nasdikirin bi şehadeta wî gelekî banbor bûn. Di heman demê de gotina dawî ya bavê min berî xwe şehîd bikeve got ku şehîd namirin."

# Armanca guhertina minhac aktîvkirina xwendekaran e

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîra Hac Elî diyar kir ku wan di sala 2024'an de di guhertina minhac û pêşxistina asat perwerdeyê xebateke mezin dan meşandin û wiha got: "Armanca me ji van guhertinan pêşxistin û aktîvkirina xwendekaran di hundirê refê de ye."**

Qada perwerdeyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê yek ji girîngtirîn qadên jiyanî ye. Di vê qadê de xebateke pir mezin tê meşandin. Di sala 2024'an de hijmara mamosteyên girêdayî Desteya Fêrkirin û Perwerdeyê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 41 hezar û 341 mamoste ne. Hijmara xwendekaran jî 838 hezar û 814 xwenekariN . Ev xwendekar li ser 4 hezar û 134 dibistanan hatine belavkirin. Ji bo pêşxistina asta perwerdeyî û bilindkirina asta mamosteyan, bê navber perwerde tên dayîn. Îsal jimara mamosteyên jin ku hatine perwerdekirin gihaşt 972 mamoste. Di heman demê de ji bo tevahiuya mamosteyan perwerde hefteyê rojekê tê dayîn. Ev perwerde ku di roja Şemiyê tê dayîn, li gorî qomîteya perweerdeyê tê destnîşankirin.
Di derbarê kar û xebatên Desteya Fêrkirin û Perwerdeyê ya sala 2024'an, Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîra Hac Elî ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên sala 2024'an

Semîra Hac Elî diyar kir ku ji bo perwerdekirina bîroyên serjimêriyê, perwerde ji hemû ofîsan re li hemû kantonan hat dayîn, da ku bikaribin li ser bernameyê nûjen kar û xebatên xwe bidin meşandin û wiha got: "Komên kar jî hatin perwerde kirin li ser sêstema nirxandinê. Her wiha di aliyê arşîfên dibistanan de jî perwerde ji komîtê perwerdeyê yên ku di hundirê hemû kantonan de li ser 4 rojan perwerde hat dayîn. Perwerdeyên akademiyan li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewamin, çi ji aliyên biranşan bin, çi jî ji aliyê rêxistinî û bîrdozî bin. Akadimiya Perwerde û Lêkolînên Istatîjîk girêdayî Desteya Perwerdeyê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew jî berî du mehan perwerdekirina beşekî ji mamoset û rêveberiyên dibistanan bidawî kirin. Ya herî girîng li cem me avakirina meclisên zarokan û aktîvkirina wê di hundirê dibistanan de ye. Ev yek jî bi belge hat diyarkirin û hemû desteyên perwerdeyê li kantona li ser esasê wê meclisên malbatên zarokan ava dikin. Mamosteyên bexçeyên zarokan jî li ser aliyê pedekojî û şêwazek nû ji wanedayînê ku biçalakî be bêtir perwerde dîtin. Her wiha minhacê bexçeyî zarokan bi erebî amadeye wê were belavkirin û bi kurdî jî li ser çapê ye."

### Astengiyên ku rastî me tên

Semîra Hac Elî da zanîn ku astengiya sereke êrişên dewleta dagirker li ser herêmê ye, ji ber ku dibistan jî bi van êrişan bandor dibin, dema êriş çêdibin dibistan tên girtin û di encamê de wane li xwendekaran diçin. Her wiha di dema dawî de dibistan bê av û bê elekitrîk man sedema êrişan li ser binesaziyê û wiha got: "Em rastî astengiya çûn û hatina mamosteyên ku waneyan li gundan didin tên. Zû bizû xwediyên erebeyan qebûl nakin ku mamosteyan bibin ji ber zehmetiyên rê. Her wiha gelek dibistan sedema êrîşan hatina rûxandin. Ev jî dibin astengî li pêşiya, pêwîstî heya ku ji nûve werin avakirin lê ev yek dem dixwe, ji ber ku rewşa ku Bakur û Rojhilatî Sûrî ya ku têre derbas dibe nabe alîkar ku bikaribin dibistanan avabikin. Di heman demê de çaksazkirina dibistanan jî di nav pirojeyên me de ye, pêwîstî heya ku hemû dibistanên me werin çaksazkirin lê em her sal hijmarek ji wan digrin dest. Her wiha zehmetiyên peydakirina alav û amûrên perwerdeyê hene. Li hin dibistanan du dewam hene loma xwendekar ji ber kêm bûna seatan hewqasî derfetan nabîne ku sûdê ji waneyên xwe bigre. Li gorî van zehmetiyan jî lê qada perwerdê xwendina wê berdewame. Her wiha em destek dayînê didin hemû xwendekaran da ku ji qada xwendinê bê par nemînin. Mînaka ber biçav koçberên ku ji Libnanê hatin heya niha zêdetirî 4 hezar xwendekar derbasî dibistanên Rêveberiya Xweser bûne."

### Pirojeyên dema pêş

Hevseroka Desteya perwerde û fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîra Hac Elî axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got: "Meclisên perwerde û fêrkirinê ya Bakur û Rijhilatê Sûriyê hat avakirin, niha em kar dikin ku li hemû kantonan vê meclisê avabikin da ku bi desteyan re kar bikin.
-Pêşxistin û guhertinên minhacan berdewame û her sal hin ref in.
-Perwerdekirina mamosteyan li ser minhacên nû yê ku hatine guhertin.



-Perwerdeya roja şemiyê jî berdewame û li gor pêwîstiyên mamosteyan komisyon perwerdeyê destnîşan dikin.
-Her wiha em kar dikin ku ev du dewamiya di dibistanan de heyî rakin da ku ji bo xwendekara nebe asteng.
-Pirogiram ji bo giştî perwerdeyê wê di qenala Rojava TV de were weşandin.
-Kişandina dîmenên wanedayînê yên xwendekarên refa 1 û 4 him erebî him kurdî û wê li ser qenala Rojava TV were pêkêş kirin. Ji bo him xwendekar û him jî mamoste sûdê jê bibînin.
Pirogiramên li ser perwerdeyê yên hevdîtinan bi kurdî û erebîye.
Her wiha hewildanên me hene ku em dibistanên pêşeyî li hemû kantonan vekin."



# 'Divê kurd bi yek wesîqeyê herin Şamê'

Endamê Komîteya Rêveber a KNK'ê Silêman Ilyas da zanîn ku ji bo mafê kurdan li Sûriyê were parastin divê partiyên kurdî bi yek wesîqeyê biçin Şamê û wiha got: "Yekrêzî dikeve ser milê partiyên siyasî ji ber ku ew amûrên siyasî ne ji bo pêkanîna armancên gelê kurd."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Hevrêzî û yekbûna kurdan niha bûye mijareke ku dest jê nayê berdan ji bo gelê kurd, nexasim li Rojavayê Kurdistan û piştî ketina rêjîma Beisê. Çendîn hewldan li ser pêkanîna yekrêziyê çêbûne, lê hîna pêk nehatiye. Derbarê heman mijarê, endamê Komîteya Rêveber a Kongreya Netewî ya Kurdistan (KNK), Silêman Ilyas bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Di nav helkeftin û geşedanên ku Sûriyê tê re derbas dibe, hevrêziya kurdî çiqasî girîng e?**

Em dizanin ku pêvajoya Sûriyê tê re derbas bû û êrişa Tehrîr Elşam, bi giştî pilanên navnetewî û herêmî bûn. Yê ku destek dane Tehrîr Elşam û di encamê de giha Şamê, dewletên weke Israyîl, Amerîka û hêzên navnetewî bûn. Îroj rewşa Sûriyê nezelal e, lê jê girîngtir ew e ku em weke gelê kurd rewşa xwe baş bizanibin. Çiqasî ku rewşa Sûriyê ne zelal be, divê em weke gelê kurd bi hev re zelal bin, ji ber ku wê ev nezelalbûn bandoreke mezin li me bike. Niha aliyek ji kurdan girêdayî koalisyona Sûriyê ne, ew dixwaze ku bi hikumeta nû ya Şamê re danûsitandinan bike, lê heta niha bêrol in. Li vir dewleta



Tirk bi hemû hêza xwe dixwaze li dijî gelê kurd û Rêveberiya Xweser kar bike. Aliyên kurdî yên ku bi koalisiyonê re ne, mîna ecindeyekê ne di destê dewleta Tirk de. Lê em weke gelê kurd bi yekîtiya xwe, vê ecindeyê û vê pelikê ji destê dewleta Tirk derxin. Herwiha gelê kurd li Rojava tekez bikin ku ew bi yekdengî bêjin 'em kurd, yek in, sûrî ne, mafê me heye, tu têkiliya me dewleta Tirk re nîne û em li Sûriyê mîna pêkhateyên din mafê xwe dixwazin.'

**-Di hevdîtinên navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Demkî de yên pêşdemiyê, eger yekrêziya kurdî çêbibe wê çawa be û eger pêk newe wê çi bibe?**

Niha amadekarî ji bo hevdîtina Rêveberiya Xweser û tevahiya partiyên siyasî bi hikumeta Demkî ya Sûriyê tên kirin. Lewma jî divê partiyên kurdî û tevahiya gelê kurd wesîqeyekê ji bo bidesgirtina mafê xwe amade bikin. Ango pêwîste gelê kurd bi yek wesîqeyê biçin Şamê û hemû partiyên siyasî yên kurdî li ser vê wesîqeyê bighên hev. Yekbûna partiyên kurdî li ser doznameyekê û bi hev re biçin Şamê rewşeke cêwaz bi xwe re tîne ku her aliyek ji serê xwe û bê lihevkirinê biçe Şamê. Eger gelê kurd û partiyên kurdî bi yekdengî doza mafê xwe bikin ne mîna ku bi du aliyîtiyê bang bikin. Îro rewşa gelê kurd di xeteriyeke pir mezin de ye. Îro şandeyên Amerîkî û Fransî li Qamişlo dixwazin ku herdu aliyan (PYNK û ENKS) bighînin hev. Ew niha bi vê siyasetê dixwazin destekê bidin gelê kurd da ku mafê xwe di destûrê Sûriyayek nû de biparêzin. Eger ew niha vê yekê dixwazin, gelo çima em weke gelê kurd û û partiyên siyasî bi xwe yekrêziyê çênakin? Lewma jî tişta ji me tê xwestin ew e ku em yekrêziyeke kurdî ava bikin.Di heman demê de em bidin tekezkirin ku em parçekek ji axa Sûriyê ne. Hem jî divê doza bidestxisina Sûriyeke nenavendî û demokrat bê kirin ku mafê hemû pêkhateyan di serî de yê gelê kurd were parastin.

**-Hetanî ku mafê gelê kurd mîna hemû pêkhateyên din di Sûriyeke demokras de were bidestxistin, pêwîste çi were kirin?**

Rêveberiya Xweser ji destpêka damezrandina xwe ve heta roja îro ji

Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd
أحزاب الوحـــدة الوطنيـــة الكرديـــة

bo avakirina sîstemeke demokratîK li Sûriyê, kar û xebat kir. Ev yek jî pêk hat, gelê kurd û hemû pêkhateyên din ên ku di bin zilm û zordariyê de bû hatin parastin. Di heman demê de hemû herêm ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin. Herwiha Rêveberiya Xweser destek da tevahiya gelên Sûriyê. Me bi hezarên şehîdan di berdêla azadiya gelê kurd de daye. Ev xebata ku Rêveberiya Xweser daye meşandin, hemû gavên baş in û destkeftiyên giranbuha ne. Lewma jî ya girîng ew e ku em xebata xwe bi encam bikin û armanca ku ji ber wê xebat dihat kirin pêk were. Pêwîste hemû xebata dihat kirin li ser rûyê erdê pêk were û Rêveberiya Xweser li gorî guhertinan tevbigere. Bi pêşveçûna geşedanan re û ketina rêjîma Beisê gava yekem ku Rêvbereiya Xweser avêt ji bo yekîtiya Sûriyê ew bû ku alaya serxwebûna Sûriyê hilda. Ev yek gaveke dîrokî bû û wê ji Rêveberiya Xweser re bikeve pirtûkên dîrokê de. Lewma jî destpêkê pêwîste yekrêziya kurdî pêk were, mijara demokrasiyê, jiyana hevbeş û demokrasiyê li pêş be. Li aliyekî din em bidin xuyakirin ku kurd pêkhateyeke sûrî ye. Lê kurd wekî netewa duyemîn bi hejmara xwe, ew xwedî maf in. Yekrêziya kurdî û parastina vî mafî di dema heyî de gelekî girîng e û ev yek dikeve ser milê partiyên kurdî de, ji ber ku partî amûrên siyasî ne ji bo pêkanîna armancên gelê kurd.

# 'Gel jî di xizmeta koçberan de ye'

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Rêvebera Ofîsa Plan û Serjimariyê ya Kantona Cizîrê Buşra Şêxê diyar kir ku ji ber rewşa ku gelê Efrîn, Til Rifet, Şehba û Helebê li her bajarekî navendek hatiye erkdarkirin da ku navên penaberan qeyd bike. Ev navend hemû jî li ser yek sîstemê kar dikin, armanca me ew e ku tu kes ji mafê xwe bê par nemîne û gel jî alîkariya koçberan dike.**

Ji 28'ê Berfanbarê ve gelên Efrîn piştî berxwedaniya 7 salan carek din ji bo êriş û rewşa heyî neçar man dev ji Şehba û gelek gundewarên wê berdin û berê xwe bidin ber bi herêmên Rêveberiya Xweser ên bi ewle. Lewma tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo destek dayîna wan ketin tevgerê de û barê koçberan girtin ser milê xwe. Di derbarê kar û xebatên ofîsa serjmariyê ya ji bo pêşwaziya penaberan Rêvebera ofîsa plan û serjimariyê Buşra Şêxê ji Rojnameya me re axivî.

### 'Gel jî di xizmeta koçberan de ye'

Buşra Şêxê da zanîn ku destpêka ku koçber derbasî aliyên Tebqa û Reqa dibin, li wir jî kar û xebat ji bo wan tên kirin û wiha got: "Kesê ku derbasî aliyê Hesekê dibe li navenda Panorama tên qeydkirin. Li wir tîmê serjimariyê amadeye, her wiha tîmekî din jî heye tenê erkê wan ferzkirina penaberên ku navê xwe qeyd kirine ye. Ferzkirina wan jî li gor cihên ku di nav destên me de hene çi xewgeh, dibistan û ekademî bin. Tîm hemû hewildanên xwe dikin van kesan bi cih bikin û bi wan re bibin alîkar da ku rastî nexweşî û astengiyan



newin. Her wiha li bajarê Qamişlo li lîstikgeha 12'ê Adarê jî navend ji bo qeydkirina penaberan hat vekirin, piştî ku malbat xwe li cem me qeyd dike em berê wan didin navenda Mihemed Şêxo li wir çadir hatiye danîn. Rêveberiya Xweser wan li wir ferzdikin û pêdiviyên wan yê pêwîst pêk tînin. Kesên ku hîn sêstem nasnekirine û berê xwe didin cem mirovên xwe di bajar de, di nav hemû bajaran de jî mecalisên bajar van kesan li gor forma me ye taybet wan qeyd dikin û wan qeydan radestî me dikin."
Rêvebera Ofîsa Plan û Serjimariyê Buşra Şêxê axaftina xwe bidawî kir û wiha got: "Kesên ku van penaberan qeyd dikin endamên saziyên Rêveberiya Xweserin, ev kes xwepêşandan tên. Hemû saziyan rewşa ewarte ragihandiye ji bo van penaberan û endamên xwe xistine dibin xizmeta wan de. Sîstema kar ji seat 8'ê sibehê dest pê dike heya 12'ê êvarî. Ev endamên ku kar dikin piraniya wan jinin. Tevî ku rewşa xizanî û aborî ya ku gelên herêmê têre derbas dibin jî, lî destekdayîna wan ji bo penaberên Efrînê qut nebûye û hemû hewildanên xwe dikin ji bo wan û pêdiviyên wan. Di heman demê de komeleyên tenduristiyê jî hertim di xizmeta penaberan de ne û wan ji nexweşiyên giran diparêzin."

# Dewleta Tirk bi xeyalên Osmaniya Nû xaka Rojava dagir dike

Çalakvanê siyasî û hiquqî Cubraîl Misțefa diyar kir ku çawa dewleta Tirk a dagirker di sala 2018' an de li Efrînê sucên şer pêk anî û komkujî kir, îro jî dixwaze heman qirkirinê li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevahî bide meşandin.

**Amara baran/Qamişlo**


Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayê wê binpêkirinên ku di Efrînê dikin gihaştiye asta sûcên şer li dijî mirovahiyê. Çalakvanê siyasî Cubraîl Mistefa di vê çarçoveyê de bi rojnameya me re axivî.

### 'Dewleta Tirk li heremên dagirkirî hişmendiya tirkkirinê dide avakirin'

Cubraîl diyar kir ku dewleta Tirk li ser esasê hişmendiya şofînizmê qirkirin, dizî û guhertina demografîk li Efrînê pêk tîne. Dewleta Tirk li Efrîna dagirkirî nêzê 40 xewgihên mêtingeriyê ava kirine û pê re jî demografiya heremê da guhertin. Beriya dagirkirina Efrînê ji sedî 80 gelê kurd li wê dijiya, lê pişte ku Efrîn hat dagirkirin ji sedî 20 kurd tê de man, ew jî rojane ji aliyê dewleta Tirk ve têne revandin û qetilkirin. Dixwaze bi hişmendiya yek al, yek ol û yek zimanî tirkkirinê li heremên dagirkirî bide avakirin."

### 'Dewleta Tirk bi komkujiyan dixwaze xeyalên Mîsaqa Mîllî pêk bîne'

Cubraîl da zanîn ku Dewleta tirk di sala 1920 'an de bi hilweşandina osmaniyan re dixwastin bi awayekî xeyalên xwe yên Mîsaqa- Mîllî pêk bînin. Û wiha domand " dewleta tirk bi vê syasetê derbasê axa suriyê dibe û sûcên dijmirovî pêk tîne.



Li ser vê siyasetê gelê Efrîn hat koçberkirin û di sala 2018'an de bi darê zorê derbasê Şehba bûn û di herema Şehbayê de gel xwe bi rêxistin kir û saziyên sivîl hatin avakirin. Ji sala 2018'an heta sala 2024'an rojane ew herem ji aliyê dagirkeriya tirk û çeteyên wê ve dihat topbarankirin, û di wan topbaranan de gelek komkujî hatin çêkirin, di sala 2019'an de zêdetirê 10 zarok li Til Rifatê di komkujiyê de jiyana xwe ji destdan. Di heman salê de jî li gundê Aqîbê jî li ser gelê Efrînê yên sivîl û karker û yên ku ji bo debara jiyana xwe bikin li wir kar dikirin hatin qetil kirin.

### Çeteyên dagirkeriya tirk gel neçarê koçberiyê kirin

Cubraîl anî ser ziman ku dewleta tirk û komên girêdayê wê di 29'ê Mijdarê de êrîşê herema Şehbayê kirin û dubare koçberî hat jiyankirin, gelek welatî bi taybet jin rastî qetilkirin û destdirêjiyê hatin, komên girêday dagirkeriya tirk û yên bi navê hêza hevbeş û çeteyên Hemzat û Siltan Murad li gundê Ehdas û Tilrifatê serê jinan jêkirin û gelek welatî revadin. Piştî Şehba û Helebê çeteyên dewleta tirk êrîşê Minbicê kirin û dixwazin ku bajarê Minbicê û gundewarên wê dagirbikin û bi taybet malbatên kurd yên ku li wir dijîn rastê komkujiyan tên û malên wan tên talankirin, ev jî li berçavê saziyên hiqûqî tê kirin, lê biryarên pir cidî li hemberê dewleta tirk nayê girtin, ger pêşî li van komkujiyan neyê girtin wê komkujiyên pir mezin li bajarê Minbicê pêk werin. Pêwîste hêzên navnetewî bi erkên xwe rabin û dewleta tirk wek dewleteke dagirker bihesibînin.Yekîtiya navnetewî heta niha li gor berjewendiyên xwe yên siyasî ji 2018'an de tu biryar heta niha ji bo Efrîn û heremên ku di bin dagirkeriyê de ne negirtiye.



### Dewleta tirk dixwaze Rêveberiya Xweser ji holê rake

Cubraîl got Binpêkirinên dewleta tirk li ser herema Bakur û Rojhilatê Sûriyê gihaştiye asta sûcên şer û bi taybet jî cihên xizmetguzarî dike hedef û topbaran dike. Wiha domkir" Di sala 2023'an de li Bakur û Rojhilatê Suriyê nêzîkê 6 milyon mirov ji pêdiviyên jiyanê qutkir. Armanca dewleta tirk qirkirina gelê kurd e. Dewleta tirk dixwaze hebûna xwe di berdewamiya sîstema Mistafa Kemal Ataturk û di qirkirina gelê kurd de pêkbîne. Bi avabûna Rêveberiya xweser û QSD'ê peymana millî ya dewleta tirk li erdê ket, ji bo wê jî dixwaze rêveberiya xweser ji holê rake ku bikaribe projeya xwe pêk bîne. Ji bo ku li ser masaya qirîzê ya sûriyê hêza xwe pêk bîne dixwaze rêveberiya xweser zeîf bixe. Di milê qanûnî de gelek raporên navnetewî de binpêkirinên ku dewleta tirk li Bakur û Rojhilatê Suriyê pêk tîne gihaştiye asta sucê şer.

### Erdoxan bi hişmendiyeke xeternak tevdigere

Cubraîl diyarkir ku Erdoxan bi hikumeta edaletê re li ser du zihniyetan dimeşe ew jî zîhniyeta herê xeter li dunyayê li ser mirovahiyê, û got" zîhniyeta ku erdoxan li ser dimeşe şovînîzim û nijatperestiye, ji derveyê xwe kesê qebûl nake. Çeteyên girêdayê tirkiyê di asta qanûnî de yên herê xeter di cîhanê de ne, dema em di aliyê edaletê de mêyzebikin dewleta ku alikarî bi çeteyan re bike ew dewlet hesab jê tê xwastin, wan çeteyên ku dewleta tirk avakirine tu pîvanên şer nasnakin. Heta niha dewletên navnetewî û yekîtiya netewî li hember wan Çeteyan tu biryarên cidî li hember alikarî û perwerdeyên dewleta tirk ji bo çeteyan dike nagire.

### Yekîtiya Netewî bêdenge

Cubraîl di dawiyê de bang li yekîtiya netewî kir û got" Di milê dîplomasî de û di yekîtiya navnetewî de biryar were girtin ku dewleta tirk dewletekî dagirkere li ser axa suriyê. Û bide xuyakirin, binpêkirinên ku li heremên dagirkirî hatine kirin dewleta tirk berpirsiyare. Dewleta tirk beriya ku rejîma BAAS hilweşe di milê qanûnî de xapandin dikir û digot ku li gor pêymana Edeneyê bi erêkirina hikumeta Beşar Esed ez derbasdibim. Bi hilweşandina hikumeta Beşar el Esed re jî peymana heyî jî hildiweşe, pêwîste di asta dîplomasî û siyasî de biryar were girtin ku dewleta tirk dewleteke dagirkere û hesab jê were xwestin.

# Destekdayîna Heyva Sor a Kurd ji bo koçberan

**Diyala Nîdal /Qamişlo**

Endamê Rêveberiya Heyva Sor a Kurd Ehmed Ibrahîm diyar kir ku ew bi tevahiya derfetên xwe hewil didin pêdiviyên koçberan dabîn bikin û bi taybet di milê tendirustiyê de biu wan re bibin alîkar.

Di destpêka ku koçberên Heleb û Şehbayê berê xwe dan herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser, Heyva Sor a Kurd ji her aliyî ve alîkariya koçberan kir. Herwiha di aliyê tendirurstî de gelek destek da koçberan, ji ber ku rewşa tendirurstî ya gelek koçberan nebaşe.

Di derbarê kar û xebatên Heyva Sor a Kurd ya ji bo koçberên Heleb û Şehbayê, endamê Rêveberiya Heyva Sor a Kurd Ehmed Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.



### 'Em herdem di xizmeta gel de ne'

Ehmed Ibrahîm balkişand ser sedema koçberbûna gelê Efrîn û Şehbayê û wiha got: "Êrîşên komên çete yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker li ser Şehba û Tilrifetê metrisiyeke mezin çêbû. Herwiha gelê van herêman bi hezaran koçber bûn, koçberan berê xwe dan aliyê bi ewle yên Rêveberiya Xweser. Di heman demê de ev hejmara mezin a koçberan zextên giran bi xwe re anî, ji her aliyî ve hem ji aliyê tendirustî, peyîdakirina pêdiviyên jiyanê û yên sereke, di aliyê bi cihkirina van koçberan de, heta dema niha em di vê zextê û giraniyê de ne."

### 'Ragihandina rewşa awerte ji bo koçberan'

Ehmed Ibrahîm da zanîn ku Heyva Sor a Kurd destpêkê de rewşa ewart e ragihand û wiha şîrovekir: "Ji destpêkê ve em bi komên xwe yên tendirurstiyê ketin tevgerê. Ji aliyê deriyê sînor û cihê pîşewazîkirinê me dest bi alîkaryê ji bo koçberan kir. Herwiha hemû bijîşk ketin tevgerê ji bo vê rewşa heyî, da ku pêşwaziya van koçberan di aliyê tendurstî de bikin. Ji ber ku koçber demeke dirêj dire de mane û gelek nexweşî bi wan re çêbûn, bi tayîbet jin û zarok di vê demê de ji ber sermayê gelek nexweşî bi zarokan re çêbûn, weke nexweşiya vairos û kilbûna qirkê hew.. Rojên destpêkê dema ku koçber hatin me sed kon li bajarê Temqa û Reqayê ji bo wan amedekirin. Lê mixabin hejmara konan kêm bûn jî, lê me hewldanê xwe didan ku kesên rewşên wan nebaş bin derbasî van konan bibin."

### 'Banga me ew ku her kes bi me re bibê alîkar'

Rêveberê Heyva Sor a Kurd Ehmed Birahîm axaftina xwe wiha bi dawî kir: " Piştî ku cihên pêşewaziyê derketin, piraniya koçberan li dibistanan cihê xwe girtin. Herwiha li bajarê Reqayî û Tebqayê piraniya koçberên Şehbayê li dibistan bi cih bûne. Em di herî aliyî de zehmetiya dikşnîn, ji ber deriyên sînoran bi giştî girtîne û alîkarî ji bo nayên kirin. Di heman demê de piştî ketina rêjîma beas rewşa herêmê bi giştî tevlîhev bûye, ji aliyê derman û pêdiviyên jiyanê ên sereke kes destekê nadê me, em weke Heva Sor a Kurd me bengewaziyek kir li gelên xwe ên li bakur û rojhilatê suriyê kir. Da ku karibin bi me re bibin alîkar da ku em jî karbin alîkariyê ji bo koçberan bikin, li Eropayê Heyva Sora Kurdistanê dest bi kampaniyakê kiriye. Heyva Sor a Kurdistanê alîkariya kom dike heta dema niha 25' hezar yoro komkiriye. Herwiha ev dirav bi gihêje Heyva Sor a Kurd li gorî van diravan bikevin tevgerê. Daxwaza me ew ku her kes bi Heyva Sor a Kurd re bibê alîkar da ku em karibin xismetê ji van koçberan re bikin."



# Îran bi kuve?

**Volqan Elî**

Şam ket, rejîma neteweperest a Baasê di nav rûpelên dîrokê de cihê xwe girt. Ji vê di serî de rejîma Baasê bi xwe berpirsiyar e. Ji ber ku firsenda dîrokê dabû wê, bi taybetî piştî îlana Rêveberiya Xweser a ku zêdetirî deh sal e bi kar neanî. Hema bêje Rêveberiya Xweser ji bo ku ew vê rêbazê hilbijêre, ti tiştê nekirî nema. Ma ev jî rê û rêbazeke pir zehmet bû? Na! Xwîşk û bratî û bi hevre jiyana gel û olan... Çi bûn zehmetiyên li ser Sûrî? Çawa xetimîbû? Bersiva van pirsan bi serê xwe nîqaşeke dûr û dirêj e. Ya ku em dizanin çendîn xençerên xwînî li nav dilê wî çikiyabû lê dîsa jî mafê gelê Kurd di serî de mafê gel û baweriyan qebûl nedikir. Qebûl nedikir ku gel û baweriyên cuda dest bidin wî û ew jî ji derdê xwe re derman peyda bike.

Niha heman rewş, ji bo Iraq, Îran û Tirkiye jî derbas dibe. Iraqê ne bi temamî jî be lê di astekê çareseriyek bi pêş xistiye. Hê jî ne diyar e çi lê were. Dîsa Tirkiye serê pirsgirêkê ye û heman tişt zêdetir ji bo wê derbasdar e. Dimîne Îran. Îran... Îran ji vê cenga dêwan dewletek ku herî bi zerer derketiye. Destpêkê wekî dewleteke şaraza ya jîr û zîrek, Îran vê zerera xwe deyndarê şirîkatiya xwe ya bi Tirkan re ye. Wisa diyar e, Îranê dîroka Safewî û Osmaniyan ji bîr kiriye. Li ser vî esasî xwestiye bi rêya Osmaniyên nû, Erdogan û Rûsyayê hîlaleke Şîa çêbike. Bi vê li ser serê Îsraîl bibe melkemotê reş. Lê mixabin Erdogan bi xwe nekarîbû, Îbrahîmê MİT'ê şand mizgefta Emewî. Di encamê de Hîlala Eliyê Hameney jî di orta xwe re şikest. Niha jî xetere hatiye li ser Heşd Şehbî yê hêzên li Iraqê. Xeleke parastina Îranê ya herî dawî ya ji derve Şîatiya Iraqê ye.

Lê mixabin Îran, çendîn sal pêşiya Tirkiyeyê li Bakurê Iraqê yanî li Başûrê Kurdistanê vekir û ev xelek kire binê fişar-zexta artêşa Tirk a NATO'yê. Di rewşa heyî de li Başûr yanî Bakûrê Iraqê ji sedî zêdetir baregehên dagirkeriya Tirk yanî NATO'yê hene. Temam, ji vê xakfiroşiya Mala Barzanî di asta yekemîn de berpirsiyar e. Lê Îranê jî bi bêdengiya xwe rêya artêşa Tirk yanî artêşa NATO'yê hema bêje dawetî Başûrê Kurdistanê kir. Em van tiştan ji bo çi dibêjin? Ji ber peymana NATO'yê... yanî eger welatekî NATO bi êrîşê re rû bi rû bimîne, NATO ji parastina wî welatî berpirsiyar e. Eger artêşa Tirk li Bakurê Iraqê bi êrîşê dewleteke re rû bi rû bimîne, NATO wê êrîşê ji bo xwe dihesibîne. Di vê rewşê de ji aliyê berjewendiyên Îranê ve, xeleka parastina derveyê Îranê, Şîatiya Iraqê di binê xetereyê de ye. Çima? Hêza leşkerî ya Şîa ya Iraqê hem ji aliyê DYE'ê ve û hem jî aliyê Îsraîlê ve hedef e. Di demêm derbas bûyî de DYE'ê di asta fermandariyê de ew ji xwe re kirine hedef. Îsraîl jî 'avê lê vênaxwe'. Artêşa Tirk a dagirker (artêşa îhtiyadî ya NATO) dewleta Iraqê dîl girtiye.

Di halê hazir de ji derveyê Kurdên di xeta Rêber APO de dimeşin, hemû hêzên polîtîk ku li Rojhilata Navîn hespê xwe dibezînin şûrê xwe yê şer xistine destê xwe û pêlî sukra Îranê dikin. Ji van a herî bi dilxwaz û hewes jî dagirkeriya Tirk e. Dibe ku Îran wisa nefikire. Her hal di demên derbasbûyî de nefikirî yan jî dîsa hate xapandin, ji ber wê yekê artêşa Tirk (NATO) Mûsil û Kerkûk niha dorpêç kiriye. Û xeta parastina ji derve ya herî dawî jî yanî Iraq ketiye xetereyê. Tevahiya Iraqê jixwe berê hatibû dagirkirin. Lê di rewşa nû de, hêzên hegemon dixwazin li Iraqê hêza Şîa jî bikin hedef û bişkînin û rasterast xwe bigihînin Îranê. Em ê ji vê dîmenê çi fêm bikin, divê Îran ji xwe re çi ders derxîne?

Yanî ji çi? Ji çarenûsa Sûriyê û ji rewşa di dorpêçê de ya Iraqê. Eger Îran, heqê çandî û siyasî yê gelên li Îranê dijîn di serî de ji bo gelê Kurd nede û xwe bi civakê re neke yek, piştî ku hêzên emperyalîst xeleka Şîatiya Iraqê tasfiye bikin ew ê berê xwe rasterast bidin Îranê. Îranek ku desteka gelê Kurd û gelan wenda kiriye, wê wekî rejîma Esed a Sûrî zûtirîn dem têk biçe. Jixwe niha jî wê dikin hedef. Lê dema Şîatiya Iraqê were tasfiye kirin Îran xeleka dawî ya parastinê jî wenda dike û bê stratejî dimîne. Stratejiya esasî ya îranê ew bû ku şer li derveyê welêt pêşwazî bike. Ev stratejî qederekê jî bi kêrî Îranê hat. Eger herî dawî nehatana tehrîqa Tirkiye û Hizbullah neşandana li ser Îsraîlê.. Di halê heyî de vê sitiratejiya Îranê derbeyeke mezin bi xiyaneta Tirkiye li îranê xwariye.

Niha Îran çawa dikare vê lîstoka Osmaniyên nû xirab bike? Ev, ne dûrî çanda welatê Îranê ye. Dema ku Îran wekî dewletek ku hê li ser xwe ye, eger rêz ji gel, çand, bawerî û fikrên cuda re bigire wan nas bike, şûrên şer ên ku ketine li ser laşê wê dikare bide aliyekî. Jixwe wê demê sedemek jî namîne ku hêzên hegemon, ji wê serî bixwazin. Îranek ku hebûna gelê Kurd, gelên Belûc, Peştû û hemû rengan nas dike, bi rêzdarî li gelê Yahûdî dinêre, li Rojhilata Navîn heqê jiyanê ji her kesî re nas dike, ma kî dikare hilweşîne? Bersiva vê divê Îran di jiyanê de bi xwe bide, ne ti kes... Eger nebe, ew ê qedera Sûrî ya Esed parve bike.

## Tirkiyê heya goristanê dê pey Kurdan biçe...

**Zekî Bedran**



Di Sûriyê de hemû hêzên peywendîdar bi awayekî lêhûrbuyî ketine tevgerê. Îsraîl rêya ku ji xwe re diyar kiriye de dimeşe. Dê kîjan dewlet çi bibêje, Sûriyê çawa were sazuman kirin, dîplomasî û nîqaşên li ser maseyan re dema xwe derbas nake. Di derheqê ewlekariya xwe de gavên yek alî davêje. Di vê mijarê de serbest e. Jixwe hemû sererastkirinên herême ji bo ewlekariya Îsraîlê tên çêkirin. DYA, Îngilîstan û hêzên din yên bibandor kiryarên Îsraîlê dipejirînin. Derveyê vê planên di derheqê heremê de jî ji hev re çêkirine.

Îran ajotin derveyê Sûriyê. Rusya windahiyeke stratejîk re rûbirû ma. Tam dihate gotin ku Rusya êdî Rojhilata Navîn de bibandore, dewletên Ereb re têkiliyên xwe xurt dike lê êdî gotin di cîh de ye ku mirov bêje 'Rusya ji Behra Spî hate qewitandin.' Bi mijûlkirina Rûsyayê ya li Ukranyayê ve destkeftiyên wê yên Rojhilata navîn ji dest girtin. Dê ji vir û şûn de Îran zêdetir bi xeteriyan re rûbirû bimîne. Dewrgirtina erkê vê dê zext li ser Trump zêdetir bibin. Qada tevgerê ya Rojhilata Navîn dê zêdetir were teng kirin. Windahiya Îranê dê tenê bi Sûriyê ve sînordar nemîne. Jixwe rêxistinên wek Hemas û Hîzbullah bi derbkirinan ve milên wan hatin sepandin. Dê Îran pirsgirêkên navxweyî ve were mijûlkirin da ku bînin asta ku nekaribe zirarê bide Îsraîlê. Jixwe welatên Ereban ên din jî bi hevpeymana Îbrahîmî ve têkiliyên wan bi Îsraîlê re hatiye asayi kirin. Dê meşa wan ya vê rêyê de bidome.

Tirkiye bi weke tê hêvî kirin ku HTŞ parastiye û amade kiriye ve dixwaze herkesê zêdetir di Sûriyê de bibe xwediyê axaftinê. Rewşa heyî diyar dike ku berjewendîyek bi dest xistiye. Ya girîng dê vê ezmûnê çawa bi kar bîne? DYE û Îsraîl dê çiqasî rê ji Tirkiyê re vekin? Erdoxan heta ku ji destê wî tê dixwaze bi DYE û Îsraîlê re di nava hevsengiyekî de be. Gotin di cîh de be Erdoxan Rusya qewitand. Şikestinek mezin hevpîşeyê xwe Putîn da jiyan kirin! Di cîhekî de wan jî ev heq kirî bû. Êdî bila li ser kiryarên xwe bifikirin.

Wek bendewariyên di vê mijarê de jî Tirkiyê nîşan da ku ew pêşiya Sûriyêyeya Demokratîk asteng in. Hemû bandor û hesabên xwe li ser derve hiştina Kurdan ya tevlîbûna ji vê pêvajoyê û ev nebe jî ji bo Kurd di vê pêvajoyê de bi destkeftiyên herî kêm ve derkevin, bi kar tîne. Hêzên HTŞ'ê ber bi Şamê ve ajotin yên SMO'yê jî ajotin li ser Til Rifat û Şehbayê. Armanca wê ya sereke bê Kurd kirina van herêman bû. Vê têr nekir berê çeteyên xwe da Minbicê. Dîsa vê jî têr nekir erîş bire ser bendavaTişrîn û Qereqozaxê. Ji bo Kurdan teng bike û heremên Xweser biqedîne, çavên Erdoxan reş buye. Reqa û heremên din de jî xwest ku Ereban provake bike. Tam xwest ku bernameya qaosê pêk bîne. Xwest ku bila her cîh tevlîhev bibe, li dijî Kurdan her cîh bibe cephe û bi vê awayê Kurd û Rêvebiriya Xweser têk biçin.

Niha jî hêzên xwe li derdorê Kobanê kom dike û dixwaze vî bajarî dorpêç bike û têk bibe. Ew Kobanê ya ku ji aliyê manewî ve ji bo Kurdan nirxê xwe zêdeye û biberxwedana ya li dîjî DAIŞ'ê ve buye sembol, dixwaze vî bajarî bixe û bi vî awayê vîna Kurdan bişkîne. Lê armanc ne tenê Kobanê ye, dixwaze tevahî rêxistinbûna Kurdan belav bike û îradeya wan ji holê rabike.

Bi civîna Urdunê ve DYE, Ewropa û welatên Ereban bangawaziya qedandina pevçûnên li Sûrî kirin. Herî kêm wisa duxwiyê ku dixwazin di Sûrî de pevçûnan bidin sekinandin û pêşiya çareseriyê vekin. Jixwe di rewşa heyî de derveyê Tirkiyê hêzên ku şer dikin nînin. Niha jî dixwazin bi gora Suleyman Şah ve şerekî derbixin. Ev gor di cihekî biçûk de bi awayekî sembolîk hebû. Li ser gefên DAIŞ'ê wê demê Erdoxan bi alîkariya YPG'ê ve ev gor birîbûn gundekê Kurdan yê bi navê Eşmê. Niha jî dixwazin vergerînin. Rêveberiya Xweser jî diyar kir ku ew girêdayî hevpeymana ne, ji ber wê ew dikarin gorê bînin cihê wê yê berê. Tirkiye axeke zêdetir dixwaze û dixwaze ku li wê derê baregeheke leşkerî ava bike û çekên giran bi cîh bike. DYE navberî dikir. Ji ber vê xwesteka wan, hevdîtin bê encam mabûn.

Diyare ku nîyeta Tirkiyê çiqas xirabe. Ji bo anîna wê gorê rewşeke wisa lezgîn jî nîne. Ji xwe ew bi salane li Eşme'yê ye. Demekî dîsa bimîne dê çi bibe? Ger ku hûnê bînin jî divê hûn girêdayî zagonên berê bin! Lê armanca wan serwerî avakirina pira Qereqozaxê û dorpêçkirina Kobanê ye. Jixwe berê jî êrîşên giran biribûn li ser wê pirê. Ew êrîş şikestin lê wan dîsa jî dev jê berneda. Ji ber vê Kobanê û Pira Qereqozaxê di bin dorpêçkirin û gefeke giran de ye. Ji bo ku Kurd li Sûriyê birêxistinî nebin û bê statû bin van tişta dikin. Di demeke ku hêzên HTŞ û yên din dibêjin Kurd parçeyekî Sûriyê ne, divê mafên xwe bigrin dest, lê Tirkiye xirabkariya xwe didomîne. Tişta destê wê de maye tenê PKK'ye. Dibêjin 'PKK xwe di nava QSD'ê de vedişêre. YPG û PKK'ê yekin û bila YPG were tasfîyekirin.' Bi xwe HTŞ kirîbûn lîsteya terorê lê niha bi hev re ne. Ev tê wê wateyê ku peyva 'Terorîst' peyveke wisa ji aliye hiqûqî ve dîyarde û mayînde nîne. Kê ji bo berjewandîyên wan nîn be jê re dibêjin terorîst. Ger hesabê wan were wê demê pirsgirêk tune. Lê tu dewleteke cîhanê YPG wek terorîst pejirandiy e. PKK lîsta terorê de ye. Tirkiye bi vê yekê ve derdikeve rê û dibêje YPG'ê PKK ye, xwe di nava QSD'ê de veşartiye. Ji ber vê jî dixwaze tevlêbûna Kurdan ya vê pêvajoyê taloq bike. Li ser erdê bi dorpêç û êrîşan ve ji aliyê sîyasî û dîplomatîk ve jî bi vê awayê dixwaze Kurdan bê bandor bike.

Kurd û dostên wan, derdorên demokratîk divê bizanibin ku Rêveberiya Xweser di bin dorpêçeke giran de ye. Heta ku ev nivîs were parvekirin dibe ku êrîş destpê kiribin jî…

## Li Sûrî serdemeke nû û Kurd



**Farûk Sakik**

Li Sûrî, bi ketina rejîma Baasê re, Rojhilata Navîn derbasî pêvajoyeke nû bû. Herkesî li gorî berjewendiyên xwe siyaseta xwe ya Rojhilata Navîn guhart. Heyet û desteyên dewletan ber bi Şamê birêketine jî. Herkes li dû ye ka çawa dikarin ji nû ve dîzaynkirina Sûrî ye de sûd wergirin.

Dewleta Tirkiyê ya dagirker jî ketiye nav liv û tevgereke çawa dikare statuya rêveberiya xweser tunebike. Nexasin ku ji nû de di dîzaynkirina Sûrî de Kurd bibin xwedî statuyek. Bi çeteyên xwe êriş dike. Dema encam negirt dest bi dîplomasiyê kir. Karta xwe ya NATO bi kar tîne. Dibêjin, heger Kurd li wê derê bibin xwedî statuyek wê welatê me bikeve bin xeteriyê. Di van xebatên xwe de her wek PKK'ê li herêmê ye û Tirkiyê tehdît dike. Medya xwe ya şerê taybet xistin dewrê. Bi agahiyên ne rast bi propagandayek derew dixwazin sîstema vê derê di çavên cîhanê de wek talûkeyek nîşan bidin. Bersiv Murat Karayilan di êvara 16'ê Kanûnê de di Stêrk Tv de da. Digot, "PKK li herêmê nîne. Li dijî DAIŞ'ê şer kir û piştre vekişiyaye baregihên xwe. Yên li wê derê mane APOCÎ ne. Ev Apocî li her deverên cîhanê hene. Yên paradîgmaya Rêber Apo ecibandine vê sîstemê diparêzin. Di demek wiha de me dît Îbrahîm Kalin li Şamê poz dide kamerayan. Her wek pesnê xwe bide û bibêje; ez û Colanî hevalên hev in. Ew hîç bila pesnê xwe nede, ji xwe me di serî de dizanîbû ku hûn hemû komên cîhanîst û çete hevalbendên hevin.

Ji bo vê yekê Erdogan ew anî serê îstixbaratê da ku li Tirkiyê berbi sîstemek îslamîst ve bibin.

Îro jî dixwaze ew hevaltiya xwe ya bi Colanî re, li dijî Kurdan bi kar bîne. Dema ku em li daxuyaniya Colanî ya 14'ê Kanûnê dinêrin, Kalin tiştê li du ketiye bidest nexistiye. Vîrusa xwe ya dijminatiya Kurdan nikaribî li Şamê belav bike. Carek din vegeriyan NATO'yê. Gotin, ji bo şerkirina bi DAIŞ'ê re em 3 Tugay Komando bişînin herêmê. Lê niyeta wan xirab hat dîtin û nehat qebûlkirin. Dema ku ev niyeta wana xirab li vê derê jî bersiv nedî artêşa ku ji çeteyan ava kiriye SMO, xist dewrê û kişkişî Kurdan kir. Lehengiya şervanên Kurdan ev êrişên çeteyên dewleta Tirk da sekinandin. Li gelek deveran derbên giran xwarin û paşve vekişiyan.

Lê em dîsa derbasî berî 27'ê Mijdarê bibin. Bi Rêber Apo re wê hevdîtinek çêbibûya. Çênebû û şerê Sûrî dest pê kir. Tu kesî texmîn nedikir di demek waha de ev şer wê dest pê bike. Aliyên ku ev şer bi rêxistin dikirin jî texmîn nedikirin. Dewleta Tirk rol û mîsyona Rêber Apo dîtibû. Dixwestin bi Rêber Apo re pêşeroja Sûrî û statuya rêveberiya xweser çareser bikin. Lê Rêber Apo tu carî bersiv neda daxwazên wan yên tunekirina sitatuyê û qebûl nekir. Berevajiyê vê yekê ji bo vê sîstemê di çareseriya dîzaynkirina Sûrî de bibe modêlek da pêş wan. Li ser vê yekê hevdîtin pêk nehat û tecrîd domandin.

Piştî ku şer dest pê kir wan jî êdî têkiliyên xwe yên bi çeteyan re xistin dewrê û rasterast êrîşî rêveberiya xweser kirin. Dixwazin beriya 'Masaya çareseriyê' her tiştî li gor xwe çêkin û bi hovîtiyek mezin êrişî Kurdan dike. Kurd jî ji bo yekîtiya xwe ava bikin dest bi hevdîtinan kirine. Dixwazin heyetek ji hemû pêkateyên kurd pêk tê bişînin Şamê. Sed sal berê di dîzaynkirina Rojhilata Navîn de nehiştin Kurd bin xwedî statuyek. Kurd jî îro dixwazin ku dîrok xwe dubare neke.